# JI BO

- Li dijî tundûtûjiya Mêran-Dewletê, mafê me yê jiyanê,
- Karê misoger, dahatûya biewle,
- Mafên jiyan û siruştê,
- Siyaseta pirdeng û demokratîk,
- Pêkvejiyan,
- Aşitiyeke birûmet,
- Edalet û azadî,
- Rêveberiyên herêmî yên demokratîk,
- Rawestandina şer û têkbirina tecrîdê,
- Bidestxistina destkeftiyên me û sazî û dezgehên me,
- Îradeya me ya rehîngirtî ya li zindanan,
- Bipêşxistina pergala hevserokatiyê û temsîliyeta yeksanî,
- Hilweşandina desthilatiya mêrane,

## EM Ê
## Bi coş û peroş li ber xwe bidin!

BI JINAN DIGUHERE

HDP KADIN MECLİSİ

# BI JINAN DIGUHERE

HDP
KADIN MECLİSİ

Desthilatiya siyasî, bi zimanê kîn û kerbê û bi pratîkên bêcezatiyê dibe sedema tundûtûjiya meran a li hemberî jinê. **Em ê dawî li êriş, destdirêjî, qetilkirin û îstismara li ser zarokan bînin.**

BI JINAN DIGUHERE

Em ê keda jinan a navmalê, **bi ewlehiya civakî misoger bikin.** Em ê dawî li pergala OHAL û **KHKyan a ku karê me û nanê me ji dest me standiye, bînin.**

BI JINAN DIGUHERE

Em ê talankirina bajar û daristan û robar û zozan û baxçeyên zeytûnan rawestînin. **Em ê mafên hewa, av, ax, gur, çûk û daran jî biparêzin.**

BI JINAN DIGUHERE

Em ê dawî li pergala zayendparêzî, neteweparêzî, mezhebparêzî, **tekparêzî û zimanê şerxwaziyê ya ku jiyana me tarûmar kiriye, bînin.**

BI JINAN DIGUHERE

Em ê di serî de pirsgirêka kurd û hemû pirsgirêkên Tirkiyeyê, bi rêya **demokratîk çareser bikin** û bi xwîşkûbiratî, bi hev re bijîn.

BI JINAN DIGUHERE

**Em ê dawî li pergala tecrîdê ya** ku welatê me û devera me dorpêç kiriye bînin û aşitiyeke mayînde û birûmet pêk bînin.

BI JINAN DIGUHERE

Em ê dawî li pratîkên derhiqûqî yên ku jiyana me tarûmar kirine bînin û pergala **dadgeh û zindan û tecrîd û cilûbergên tektîp/tekreng hilweşînin.**

BI JINAN DIGUHERE

Em ê dawî li perwerdeya paşverû û zayendparêz û tekparêz a li dibistan **û fêrgeh û pirtûk û akademiyan bînin.**

BI JINAN DIGUHERE

Em çawa bixwazin em ê wisa bijîn, em ê bi dilê xwe bigerin û kes nikare têkilî cilûbergên me bibe. **Em nahêlin ti kes têkilî mafên me, jiyana me, cilûbergên me, kenê me, baweriya me û nasnameya me ya zayendiyê bibe.**

BI JINAN DIGUHERE

Em ê li malê, li kolanan, li qada civakî û siyasî, têkoşîna xwe xurt **bikin û em ê li meydana girseyî pergala hevserokatiyê û temsîliyeta** yeksanî ava bikin.

BI JINAN DIGUHERE

Wekî li her qada siyasî, em ê di sîstema serokkomariyê de jî li şûna **"yekzilamiyê", pergaleke azadîxwaz û yeksanîxwaz ava bikin.**

BI JINAN DIGUHERE

Em ê rêveberiyên herêmî yên **demokratîk careke din ava bikin û dawî li pergala qeyûman** a ku dest daniye ser îradeya me bînin.

BI JINAN DIGUHERE